

Aheng Di Helbestên M. Zahir Ertekin De

Halil AKGÜL¹

M. Zahir Ertekin Şiirlerinde Âhenk

Öz

Şiirde âhenk birtakım ritim teknikleri ile sağlanmaktadır. Dış âhenk (ölçü) ve iç âhenk (kafiye, redif, tekrar) şiirin etkisini arttırmaktadır. Klasik şiirler bu unsurlara sıkı sıkıya bağlıdır ancak, yenilikçilik çerçevesinde olgunlaşmış modern şiirler kendilerini bu kalıplardan kurtarmış olsalar da bazı âhenk unsurlarından mahrum kalmışlardır. Bununla birlikte, modern şiir çeşitli tekniklerle âhenk sahibi olmuştur. Şiirin âhengi şiirin etkisini arttırmakla onu estetik bir konuma yerleştirirken aynı zamanda şairin üslubuna da yansıtılmaktadır. *M. Zahir Ertekin* iki şiir kitabıyla (*Nêrgîza Lam û Elîfê*, 2016 – *Xeyalên Kehrebayî*, 2020) modern kürt edebiyatının bir örneğidir. Bu çalışmada *M. Zahir Ertekin*'in şiirleri ölçü, kafiye, redif ve tekrar unsurları bakımından incelenmiştir. Microsoft Word ve Microsoft Excel yardımıyla ses ve söz kullanım oranları tespit edilmiştir. *M. Zahir Ertekin* şiirlerinde âruz ölçüsü kullanılmamıştır. 119 şiir arasında 12 şiir hece ölçüsüyle yazılmış olup diğer şiirler ya eksik âruz ölçüsü ile ya da serbest ölçüdedir. Kafiye ve redif kullanımı azdır. Ses ve söz tekrarlarında bazı ses ve sözler ön plana çıkmışlardır. Bu durum her iki kitapta da aynıdır.

Anahtar Kelimeler: Âhenk, Ritim, Ses Tekrarı, Şiir, M. Zahir Ertekin

Kurte

Di helbestê de aheng bi hin teknîkên rîtmê ve saz dibin. Ahenga derekî (kêş) û ahenga navekî (serwa, paşserwa, dubarekirin, cînas û ww.) karîgeriya helbestê xurttir dikan. Helbestên klasîk bi awayekî tund xwe bi van hêmanan ve girêdane lê helbestên nûjen ku di çarçoveya nûxwaziyê de kemilîne, xwe ji van qaliban rizgar kirine lê pê re jî ji hin hêmanên ahengê bêpar mane. Digel vê, helbesta serbest ahenga xwe bi teknîkên cuda bidest xistiye. Ahenga helbestê çawa ku karîgeriya helbestê xurttir dike û wê dixê bazineya estetîkê, şêwaza helbestvan jî diyar dike. *M. Zahir Ertekin* bi du pirtûkên xwe yên helbestê (*Nêrgîza Lam û Elîfê*, 2016 – *Xeyalên Kehrebayî*, 2020) ve nûnerekî helbesta kurmançî ya nûjen e. Me helbestên wî ji aliyê kêş, serwa, paşserwa û dubarekirinê ve li ber çavan raxist. Bi alîkariya Microsoft Word û Microsoft Excelê me rêjeya dangan, dubarekirina deng û

¹ Yüksek Lisans öğrencisi, Bingöl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı, xelilakgul@gmail.com, ORCID: [0000-0003-1365-8461](https://orcid.org/0000-0003-1365-8461).

peyvayn tesbîr kirin. Di helbestan de kêşa 'erûzê ya tekûz nayê dîtin, ji nav 119 helbestan 12 helbest bi kêşa xwemalî ne, helbestên din jî an bi kêşa kêma a 'erûzê an jî bi awayê serbest in. Bikaranîna serwa û paşserwayê qels e. Di dubarekirina deng û peyvayn de hin deng û peyv bêtir derdikevin pêş. Ev rewş di herdu pirtûkan de jî bi heman awayî ye.

Peyvên Sereke: Aheng, Rîtm, Rêjeya Dengan, Helbest, M. Zahir Ertekin

Harmony in M. Zahir Ertekin Poems

Abstract

Harmony in poetry is achieved through a number of rhythm techniques. External harmony (meter) and internal harmony (rhyme, word after the rhyme, repetition) increase the effect of the poem. Classical poetry adheres to these elements, but modern poetry, which has matured within the framework of innovation, has deprived itself of some elements of harmony, even though it has freed itself from these patterns. Nevertheless, modern poetry has achieved harmony through various techniques. While the harmony of the poem increases the effect of the poem and places it in an aesthetic position, it also reflects on the poet's style. M. Zahir Ertekin is a representative of modern Kurdish literature with two poetry books (Nêgîza Lam û Elîfê, 2016 - Xeyalên Kehrebayî, 2020). In this study, M. Zahir Ertekin's poems are analyzed in terms of meter, rhyme, word after the rhyme and repetition. With the help of Microsoft Word and Microsoft Excel, sound and word usage rates were determined. M. Zahir Ertekin's poems did not use the meter of prosody. Among 119 poems, 12 poems are written in syllabic meter, and the other poems are either in incomplete prosody meter or in free meter. The use of rhyme and word after the rhyme is rare. In the repetition of sounds and words, some sounds and words come to the fore. This situation is the same in both books.

Keywords: Harmony, Rhythm, Sound Repetition, M. Zahir Ertekin

Extended Abstract

Harmony, music or rhythm has always been the main element of literature, especially in poetry. In the most common definitions, poetry is said to be beautiful, fancy, rhymed and eloquent words. Of course, poetry cannot be without feelings and imagination, regardless of the language, subject and form of the poem, what distinguishes it from others and brings it forward is its rhythmic composition. Harmony, whether natural or unnatural, takes place in all manifestations as an efficient and common element in all branches of art. Aluerti has defined this in his work (narrator Ahmed, 2017: 9); "Rhythm is a natural structure, so our heartbeats, our movement, the coming together of day and night, the change of seasons, the rotation of the moon around the earth and the earth around the sun are rhythmic patterns." Rhythm here is an organized repetition of human and natural tasks and activities. In literature, harmony is achieved thanks to certain

patterns (prosody meter, rhyme, word after the rhyme) and literary arts (sound harmony). The harmony of the prosody meter, rhyme and word after the rhyme is called Outer Harmony and the one made with literary arts (synonyms, repetition, reiteration, alliteration, etc.) is also referred to as Inner Harmony. Adak (2017: 43) includes the rhyme and word after the rhyme in the inner harmony. The inner harmony is generally achieved through the technique of repetition.

In meter, prosody meter has become the main form of classical oriental poetry. Prosody meter, which is the basis of Arabic poetry, has the influence of Islam, along with Kurdish poets, many other nations also write poetry in prosody meter. In addition, some nations have also established and used native meters according to the phonetics of their language. Kurdish poets wrote their poems with both the prosody meter and the native style. In addition, the broken of the meter that can be seen in modern poetry has been described as free meter, and like every nation, Kurds write poetry with free meter. Although modern poetry has freed itself from outer harmony (prosody meter, rhyme, word after the rhyme), modern poets have not been far from harmony for the effectiveness of poetry. In modern poetry, music and rhythm have been achieved through the inner harmony, and the rhyme and word after the rhyme, which Adak accepts as the inner harmony, are included in modern poetry.

Both the outer and the inner harmony of the poem is the main feature of the poem that distinguishes it from other texts. This difference is positive. The poem, which is decorated with harmonic techniques, is expressed with strong music and rhythm. This expression also becomes the basis of stylistics. The poet bases his style on his poetry. When one considers the harmony and techniques of the poem, the style of the poet is also considered.

The purpose of this work is to present to the reader the using of outer harmony and inner harmony in modern Kurdish poetry with the example of M. Zahir Ertekin's poems. In this field, works have been done on classical poetry. Adak (2017) on the poems of Melayê Cizîrî, Ahmed (2017) on the Kamîran Bedirkhan, Hamad (2020) on the poems of Hêmin, and Ahmed (2019) on the poems of Kanî have prepared Kurdish works in this field. Also, in all works on stylistics, a section is devoted to the harmony of the poem. In the Kurdistan Region, many works have been prepared on the harmony of Kurdish poetry. The lack of Kurdish resources was a big obstacle for the preparation of this work, but we tried to overcome this obstacle by quoting the extracts.

According to the publication date of the books, we considered the poems of the two books one by one and applied both the outer harmony and the inner harmony to them. We counted the sounds of the poems and determined the percentage of sounds used. We used Microsoft Word and Microsoft Excel to count and obtain the number of sounds of the poems. In counting the sounds, the texts were cleared of punctuation.

In the poems of M. Zahir Ertekin, there is an attempt to establish classical poetry, but this attempt is very weak and his poems are broken by the meter, rhyme and word after the rhyme. Therefore, the arrangement of sounds and syllables is no longer systematic. In addition, the most powerful

technique of building inner harmony, the repetition of sounds and words freely appears in poetry. Modern poetry, which is based on innovation and has rejected traditional patterns, has focused on inner harmony rather than outer harmony and has strengthened the effectiveness of poetry in this way. M. Zahir Ertekin also published his poems in the context of modern methods.

Destpêk

Aheng, muzîk an jî rîtm hertim bûye hêmana sereke ya edebiyatê nexasim di helbestê de. Di pênasayên berbelav de ji bo gotinên xweşik, xemilandî, biwezî û bikafiye helbest tê gotin. Helbet helbest bê hest û xeyal nabe, ziman, mijar û şiklê helbeste her çî be jî ya ku wê helbestê ji yê din cuda dike û derdixe pêş, avahiya wê ya rîtmîk e. Aheng, çî siruştî çî nesiruştî di hemû diyardeyan de wekî hêmaneke karîger û hevpar di hemû şaxên hunerê de cih werdigire. Aluertî di xebata xwe de (vgz. Ahmed, 2017: 9) ev penase kiriye: “Rîtim pêkhateyeke reha ye, lewre lêdanên dilê me, birêveçûna me, lidûhev hatina şev û rojan, guherîna werzan, zivîrîna heyvê li dora erdê û ya erdê li dora hetavê bi şêweyên rîtmî ne. Rîtim li vir dubarekirineke rêxistî ye bo erk û çalakiyên mirovî û siruştî.” Di edebiyatê de aheng bi xêra hin qaliban (kêş, serwa, paşserwa) û hunerên edebî (ahenga dengan) pêk tê. Ahenga kêş, serwa û paşserwayê wekî Ahenga Derekî û ya bi hunerên edebî (cînas, tekrîr, îade, ‘eks alîterasyon û ww.) pêk tê jî wekî Ahenga Navekî tê binavkirin. Adak (2017: 43) serwa û paşserwayê jî dixê hundirê ahenga navekî. Ahenga navekî bi giştî bi teknîka dubarekirinê tê bidestxistin.

Di kêşê de ‘erûz bûye qalibê sereke yê helbesta klasîk a rojhilatî. ‘Erûz ku bingeha helbesta ‘erebî ye, bandora dînê Îslamê li ser heye, ligel helbestavên kurd gelekî mîletên din jî bi ‘erûzê helbest nivîsîne. Digel wê hin mîletan li gorî dengnasiya zimanê xwe kêşên neteweyî jî saz kirine û bikar anîne. Helbestvanên kurdî helbestên xwe hem bi kêşa ‘erûzê hem jî bi kêşa xwemalî hûnandine. Herwiha, têkçûna kêşê ku di helbesta nûjen de tê dîtin, wekî kêşa serbest hatiye binavkirin û wekî her mîletî kurdan jî bi kêşa serbest helbest nivîsîne. ‘Erûz bi pergala dengên kurd û dirêj tê sazkirin. Kêşa xwemalî jî bi hejmara kîteyan tê pîvan ku bi vê taybetmendiyê jî (kêşa birgeyî/kîteyî) tê binavkirin. Serwa û paşserwa jî tekrara heman deng an jî dengan in di dawiya tef’ile an jî misrayan de ku ligel kêşê newaya helbestê xurttir dikin. Hamad (2020: 44) pênasaya Qedamê ibnê Ceifer wiha neqil dike: “Ku helbest gotineke kêşdar û serwadar e.”

Bi nûxwaziyê çawa ku dinya awayekî vêkre di hemû qadan de guherî, edebiyat jî rastî guherînên naverokî û ruxsarî hat. Pêdivî bi mijar û peyamên nû hebû û helbesta klasîk têra derbirîna van hêmanen nedikir. Pexşan derket pêş lê helbesta klasîk jî li kêleka pexşanê bi şêwaza xwe ya nû hebûna xwe domand. Ewîlî mijar û peyvên helbesta klasîk guherîn piştî jî qalibên wekî kêş û serwa hatin piştguhkirin. Ev cure helbesta ku xwe bi qaliban ve girênade wekî helbesta azad, helbesta nûjen an jî helbesta modern hate binavkirin. Helbesta nûjen xwe ji ahenga derekî (kêş, serwa, paşserwa) rizgar kiribe jî helbestvanên nûjen ji bo karîgeriya helbestê dûrî ahengê nebûne. Di helbesta nûjen de jî muzîk û rîtm bi ahenga navekî hatiye bidestxistin û serwa û paşserwa jî ku Adak wan wekî ahengên navekî qebûl dike, di helbesta nûjen de cih werdigirin.

Him ahenga derekî him jî ahenga navekî ya helbestê egerên sereke yê helbestê ne ku wê ji metnên din cuda dikin. Ev cudabûn ji aliyê erênî ve ye. Helbesta ku bi teknîkên ahengê ve hatiye xemilandin bi muzîk û rîtmêke xurt tê

derbirîn. Ev derbirîn jî di heman demê de dibe bingeha şêwaznasîyê (stîlîstîk). Meriv dikare bêje her wêjekar û helbestvan, hunermend û heta zanyar xwedî terz û şêwazekê ye û wextê ew diaxivin an jî dinivîsîn vê şêwazê diyar dikin (Açar, 2021: 95). Helbestvan şêwaza xwe li ser helbesta xwe disepîne. Wexta meriv aheng û teknîkên ahenga helbestê li ber çavan raxîne pê re şêwaza helbestvan jî berçav dibe. Aytaç (1999: 79) dema behsa rîtmê dike, dibêje: rîtm ne ku tenê hemanke teşeyî ye ligel wê ew hêmaneke derûnî ye ku tesîra wê li ser peyvan jî heye. Lewma metn çiqasî baş be jî heger aheng û teknîkên rîtmê bi serkeftî nehatibin bikaranîn pirçaran ew hizr û xeyalên di helbestê de nayên têgihîştin-famkirin û kêmasiya ahengê nahêle ku metn bi zelalî di hişê meriv de bimîne û ew jî dibe sedem ku meriv nekarîbe bi kûrahî li ser helbestê bifikire. Ji ber van egeran dixuye ku ahenga helbestê pileya helbestê jî diyar dike.

Armanca vê xebatê ev e ku em bikaranîna ahenga derekî û ahenga navekî di helbesta kurdî ya nûjen de bi nimûneya helbestên M. Zahir Ertekin² pêşkêşî ber xwîneran bikin. Di vê qadê de li ser helbesta klasîk xebat hatine kirin. Adak (2017) li ser helbestên Melayê Cizîrî, Ahmed (2017) li ser Dîwana Kamîran Bedirxan, Hamad (2020) li ser helbestên Hêmin, û Ahmed (2019) li ser helbestên Kanî xebatên kurmançî di vê qadê de amade kirine. Herwiha, di hemû xebatên li ser şêwaznasîyê de beşek ji bo ahenga helbestê tîrî terxankirin. Li Herêma Kurdistanê gelek xebat li ser ahenga helbesta kurdî hatine amadekirin. Kêmpendabûna çavkaniyên kurmançî bû astengiyeye mezin ji bo amadekirina vê xebatê lê me hewl da ku ev astengî bi neqilkirina jêgirtinan ji holê rabe.

Nêrgîza Lam û Elîfê (2016) û Xeyalên Kehrebayî (2020) du pirtûkên bi kurdî yên M. Zahir Ertekin in. Ev herdu pirtûkên bi kurdî sînoren qada xebata me diyar dikin. Em ê li gorî dîroka weşandina pirtûkan, helbestên herdu pirtûkan yeko yeko li ber çavan bigirin û him ahenga derekî him jî ahenga navekî li wan bisepînin. Dengên helbestan dê bihê jimartin û rêjeya bikaranîna dengan dê bihê diyarkirin. Piştîre bi awayekî giştî em ê herdu berheman li gorî bikaranîna teknîkên rîtmê bidin ber hev. Ji bo jimartin û bîdestxistina rêjeya dengên helbestan em ê Microsoft Word û Microsoft Excelê bikar bînin. Di jimartina dengan de dê metn ji xalbendiyê bê paqijkirin.

Ev xebat dê ji destpêkekê, du sernavên sereke û ji encamekê pêk bihê. Piştî Destpêkê, li bin sernavê Ahenga Derekî em ê li ser kêşa helbestan bixebitin. Serwa û paşserwa jî di hin xebatan de wekî ahenga derekî hatibin qebûlkirin jî em ê metoda Adak (2017) bikar bînin û serwa û paşserwayê ne li derekî, li ahenga navekî rêz bikin. Wate, li bin sernavê Ahenga Navekî, serwa, paşserwa û

² Ertekin di sala 1976ê de li Şemrexa Mêrdînê hatiye dinyayê. Dîbistana Îmam-Xetîbê qedandiye. Li Wanê lîsansa bilind, li Erziromê doktora kiriye. Heta sala 2023yê li Zanîngeha Bîngolê xebitiye. Niha li Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê di beşa Ziman û Wêjeya Kurdî de xebatên xwe yên akademîk didomîne. Di gelek kovarên kurdî û tirkî de curbicur nivîs û helbestên wî hatine weşandin. Ji bilî berhemên wî yên pexşan sê berhemên wî yên helbestê hene. Ji wan, *Nêrgîza Lam û Elîfê* (2016) û *Xeyalên Kehrebayî* (2020) bi kurdî ne.

dubarekirin dê bibin mijara vê xebatê. Ji bo agahiyên teorîk em ê beşeke taybet terxan nekin. Di serê her mijarê de dê kurteagahî bê dayîn.

1. Ahenga Derekî

1.1. Kêş

Ahenga derekî yanî muzîka derveyî ya helbestê bi awayekî rîtmîk ji aliyê kêşa helbestê tê bidestxistin. Adak (2015: 365) kêşê wekî pîvanê pênase dike ku helbestek an jî nezmek ji serî heta dawî bi wê pîvanê tê nivîsîn. Kêşa helbestê bi awayên cuda di helbesta her welat û neteweyan de tê dîtin (Ezîz, 2016: 5, vgz. Ahmed, 2019: 61). Ev cudabûn dibe ku ji aliyê deng, kîte an jî risteyan pêk bînin. Kêşa helbestên ‘erebî (‘Erûz) li ser dengên kurt û yê dirêj ava bûye, kêşên xwemalî jî bi giştî xwe li ser hejmara kîteyan diyar dikin. Nebûna kêşê ku wekî kêşa serbest hatiye binavkirin bi helbesta nûjen derketiye. Kêşa serbest xwe bi taybetiyên dangan an jî hejmara kîteyan girênade, ahenga xwe ji hundir ve saz dike.

1.1.1. ‘Erûz

‘Erûz ji edebiyata ‘erebî welidiye, li gorî dengên kurt û dirêj yê zimanê ‘erebî teşe girtiye û ewilî li edebiyata farsî û piştre jî li edebiyatên mîletên cîran teşîr kiriye (Çetin, 1991). Berî Îslamê jî bi ‘erûzê helbest hatine nivîsîn lê di serdema Emewîyan de Xelîl b. Ehmed el-Ferahîdî (w. 792) bi awayekî zanistî bingeha ‘erûzê daniye. Li gorî Xelîl 16 behrên/beşên ‘erûze hene û di bin her behrê de jî hin qalibên cûda hene (Adak, 2015: 367). Ji ber ku mijara me ya sereke ne ‘erûz bi xwe ye em zêde kûr nekevin navê. Lê divê meriv zanibe ku kurdan jî bi serkeftî di helbestên xwe de kêşa ‘erûzê xebitandiye. Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Nalî, Salim û Kurdî çend helbestvanên sereke ne ku bi kêşa ‘erûzê helbestên klasîk nivîsîne. Ehmedê Xanî di Nûbihara Biçûkan de bi awayekî pedagojîk behsa ‘erûzê kiriye. Wextê em li herdu berhemên M. Zahir Ertekin dinêrin helbestên bi kêşa ‘erûzê peyda nabin. Weku me li navborî jî behs kir bi helbesta nûjen kêş şikestiyê û hatiye terikandin.

1.1.2. Kêşa Xwemalî (Kîteyî, Pênceyî)

Di helbesta kurdî de, bikaranîna kêşa kîteyî gelekî kevintir e ji bikaranîna kêşa ‘erûzê. Em kêşa kîteyî di nav helbestên goranî (hewramî) dibînin (Adak, 2017: 75). Kêşa kîteyî li ser hejmara kîteyan hatiye sazkirin. Li gorî dengên zimanê kurdî li dû her hejmarek kîteyan heman hejmar kîte tînin dubarekirin. Digel ku kêşa kîteyî bi helbesta gelerî tê zanîn, kurdan di gelek cureyên helbestên xwe de kêşa kîteyî bikar anîne.

Kurdan di keresteyên folklorê de ku berî edebiyata nivîskî jî hebûn, beyt, lawik û stranên xwe bi kêşa kîteyî gotine. Herwiha, piraniya helbestvanên goranî û helbestvanên bi hestên neteweyî rabûne dîsa ev kêşa xwemalî bikar anîne. Digel wê, di destpêka sedsala 20ê de ku heman awayî li beramberî destpêka nûxwaziyê jî tê, hin helbestvanên klasîkê vegeriyan ser kêşa xwemalî. Ferhad

Pîrbal vê rewşê wekî yek ji xasiyet û diyardeyên sîstema nû ya afirandinê pênase dike (Ahmed, 2019: 63).

Di kurdî de herî zêde kêşa kîteyî ya 5+5 hatiye bikaranîn. Digel wê, kêşên wekî: 4+4, 3+4, 5+6 û 3+4+4 jî hatine bikaranîn. Helbet bi helbesta nûjen hejmara van kêşan zêdetir bûye. Ahmed (2017: 37) li ser 12 cure kêşan bi du awayê rîtmîk tevahî 18 kêşên birgeyî nîşan dane.

Di Nêrgîza Lam û Elîfê de ji nav 51 helbestan di çar helbestan de hejmara kîteyan di her misrayan de wek hev in. *Dîsa Bahar* (8), *Bişo Carek Evî Qelbî* (4+4), *Kurtelava* (5) û *Mîm û Hê* (11) navê van helbestan in.

Va/ye/ dî/sa/ ve/bû/ bi/har
Sor/gul/ û/ nêr/giz/ hat/ne/ xwar
'Erd/ û/ ez/man/ tev/ bûn/ si/tar
Ke/s ne/ma/ye/ bê/ ciy/ û/ war

Her/ ke/se/kî/ re/ xweş/hal/ek
Di/ her/ ma/lê/ de/ der/ma/lek
Roj/ û/ meh/ ha/vîn/ di/ sa/lek
Va/ye/ dî/sa/ ha/te/ bi/har (Ertekin, 2016: 17)

We/re/ sa/qî/ bi/şo/ di/lî
Bi/şo/ di/lî/ ji/ bê/di/lî
Ne/çe/ bal/ ên/ kêm/'a/qil/î
Bi/şo/ di/lê'x/ ji/ vê/ zen/gê

He/re/ bi/k've/ na/va/ mê/ran
We/ke/ za/na/ û/ 'a/rif/an
Her/car/ her/wext/ û/ her/ de/man
Bi/şo/ qel/bî/ ji/ vê/ zen/gê (Ertekin, 2016: 57)

Ya/ reb/ ça/wa/ kim
Bes/ qîl/ û/ qal/ kim
Ruh/ xwe/ reha/ kim
Ma/lik/ a/va/ kim (Ertekin, 2016:74)
e/ger/ wes/lek/ ji/ fî/ra/qê/ der/ bî/nim
di/kim/ 'îd/ û/ di/kim/ new/roz/ ken/in/ im

bi/har/ e/ ger/ ru'/yet/a/ wî/ di/bî/nim
ji/ hes/ret/ der/ bî/rîn/a/ xwe'd/ kew/in/im (Ertekin, 2016: 86)

Di Xeyalên Kehrebayî de ku çar salan piştî Nêrgîza Lam û Elîfê hatiye weşandin, zêdetir helbestên bi kêşa kîteyî hene. Li gorî tesbîta me 8 helbest ji serî heta dawî bi heman kêşa kîteyê hatine nivîsin: *bilbil* (15), *ma ev e rêka aşiqan?*

(4+4), dil (3+4), nediyar (11), pilepil di qefesa dil de (4), poşmanname (11), sêwreke nerm bo bê zadîyê (5), şewqa wefayê zahir nebûye (8).

çî/ro/kek/ kev/na/re/ ye
ber/xik/ek/ der/ma/le/ ye
bi/rîn/ek/ hem/wa/re/ ye (Ertekin, 2020: 90)

ça/wa/ we/rim/ hoş/ya/r bi/bim
bi/ke/vim/ rê/ka/ a/şiq/an
ne/ka/rim/ meh/wî/ yar/ bi/bim
ma/ ev/ e/ rê/ka/ a/şiq/an (Ertekin, 2020: 13)

we/re/ bil/bil/ em/ bi/çin/ da/ bi/kuj/in/ nefsa/ em/ar
wê/ he/lan/dî/ pir/ he/ban/dim/ ew/ di/be/ xa/yîn/ xe/dar (Ertekin, 2020: 31)

qe/fe/sa/ min
he/we/sa/ min
we/re/ sar/ be
li/ e/za/ min (Ertekin, 2020: 93)

bex/te/war/ im/ bex/te/war/ im/ be/xte/war
to/la/z goşt/ ne/ma/ ma/ te/ hes/tî/ jî/ xwar (Ertekin, 2020: 88)

bi/rî/nek/ xe/dar/ e/ li/ min/ ra/bû/ye
we/lê/kin/ 'es/lê/ wê/ ni/za/nim/ çi/ ye (Ertekin, 2020: 61)

za/nim/ de/lal/ î
da/îm/ he/val/ î
bo/ min/ me/lal/ î
ey/ sir/ra/ 'a/lî (Ertekin, 2020: 83)

di/lo/ beş/kê/ di/nê/ pîr/ e
bi/ kes/ na/bet/ we/fa/ê/ qet
we/kî/ kel/bê/ bi/ zin/cîr/ e
bi/ kes/ ne/bet/ we/fa/ê/ qet (Ertekin, 2020: 56)

1.1.3. Kêşa Serbest


Di helbesta serbest de, di her misrayekê de hejmara tef'ileyên diguhere. Hejmara misrayan ne girîng e. Di her bendeke helbestê de dibe ku hejmara misrayan cuda be. Dirêjbûn û kurtbûna misrayan an jî dengên tê piştguhkirin. Serwayeke yekgirtî tune, helbestvan dikare li gorî dilê xwe ji serwayekê derbasî serwayeke din bibe (Kazan, 2015: 56). Têgeha helbesta serbest (vers libre) ewilî ji aliyê helbestvanê fransî Gustave Khan ve hatiye bikaranîn (Preminger û Brogan, 1993: 425). Ev têgeh bi heman wateyê derbasî edebiyata zimanên din jî bûye.

Preminger û Brogan (1993: 425) helbesta serbest kiriye du beş: *helbesta ku xwe ji hin astengiyên pîvanê rizgar kirine û helbesta ku tu pêwendiya wê bi pîvanên kevneşopî tune ye*. Çetin (2021: 276) di xebata xwe de fikrên Zahir Güvemli yên li ser helbesta serbest veguheztiye. Güvemli pênaseya helbesta serbest ne bi tunebûna kêş û serwayê dike, helbesta serbest azadiya helbestvan e ku bikaranîna kêş û serwayê bi dilê xwe bikar tîne. Yanî kêş û serwa ne jî divêtiyê lê ji bo ahenga helbestê tên bikaranîn ku ev jî fonksiyona sereke ya helbestê ye.

Kazan (2015: 56) ji bo helbestvanê ‘ereb Bedr Şâkir es-Seyyâb wiha dibêje: “Helbestvan ji teşeyê wêdetir giringî daye wateyê, weku biaxive, bi îfadeyên ji rêzê û rehet xwestiye fikrên xwe veguheze û şênbûnî li wateyê bar kiriye. Bi vî awayî erka tesîr û beralîkirina helbestê xurttir kiriye.” Ji ber vê ye ku bi modernîteyê ve helbesta serbest jî êdî hêdî hêdî wekî helbesta modern (nûjen) hatiye binavkirin û roleke civakî jî girtiye ser xwe.

Di dawiya sedsala 19ê û destpêka sedsala 20ê de helbestvanên kurd ku serê xwe bi mijarên siyasî û civakî re eşandine, qalibên helbesta klasîk şikandine û pê re jî ketine rêya nûxwaziyê. Pêşbînî kirine, pirçaran li gorî rewşa dinyayê xwestine civakê hişyar bikin an jî helbestvan bi xwe wekî takekesî bûye mijara helbesta xwe. Lewma jî bi peyvên nû, hest û xeyal û fikrên nû helbestên xwe honandine. Terikandina kêşê ku yek ji nîşaneyên helbesta nûjen e di helbestên M. Zahir Ertekin de gelekî beloq e.

Weku me di bin sernavê Kêşa ‘Erûzê de jî diyar kir, di herdu berheman de jî helbestên bi kêşa ‘erûzê tune ne. Di *Nêrgîza Lam Elîfê* de çar helbest, di *Xeyalên Kehrebayî* de jî heşt helbest bi kêşa kîteyî hatine nivîsîn. Di hin helbestan de hewl heye ku kêşa kîteyî bê bikaranîn lê yan di misraya duyem de yanî di beşek din a helbestê de kêş şikestiye. Lewma em wan helbestan jî wekî helbestên serbest qebûl dikin. Li gorî van agahiyan em dikarin derbarê kêşa helbestên M. Zahir Ertekin de vê grafîkê nîşan bidin.



Grafîk 1: Di Helbestên M. Zahir Ertekin De Kêş

2. Ahenga Navekî

2.1. Serwa

Serwa rêgezeke giring e piştî kêşa helbestê ku muzîka helbestê saz dike. Erê kêş û serwa bi hev re muzîkeke xurt dixin nava helbestê lê ne ku hewce ye bi hev re bin, her yek ji wan dikarin bi tena serê xwe jî muzîka helbestê ava bikin ku ev şêwe bêtir di helbesta nûjen de li ber çavan e (Ako, 2021: 73). Serwa, teknîka dubarekirinê bikar tîne. Di helbestên klasîk de serwa li gorî hin qaliban pêk tîne lê di helbestên nûjen de ne bi rêkûpêk je bî serwa heye û roleke giring bi rîtmê digire ser xwe. Serwa an jî qafiye, ew e ku helbestvan di helbesta xwe de, di dawiya tefîleyê an jî misrayê de hin dengên dubare dike.

Bikaranîn û dubarekirina van dengên, jîrbûn û şarezayiya helbestvan nîşan dide ku ev dengên lihevhatî û hemawaz ên bikarhatî ciwaniya helbestê û muzîka helbestê hildigire ser xwe û helbestê xweştir dike. Lewma ku muzîk û rîtma her helbestê ji ya din cîkare cude be, ev dide nîşan ku her helbestvanek bi serwayê dikare şêwaza xwe saz bike (Îbrahîm Enîs, 1952: 244, Vghz Ahmed, 2019: 83). Serwa him çêjê dide muzîka helbestê him jî derûniya meriv heta pileyekê aram dike bi rîtma wan dengên dubarekirî (Hamad, 2020: 61)

Serwaya helbestê li gorî hejmara dengên dubarekirî wekî, serwaya nîvco (deng), serwaya tam (du deng) û serwaya dewlemend (sê an zêdetir deng) hatine binavkirin. Herwiha serwaya hundirîn heye ku misra di nav xwe de dibe du tefîle û serwa li dawiya tefîleyan cih digire. Di helbestê de heman qafiye bi heman tîpan tîne nîşankirin û di helbesta klasîk de ji bo cureyên helbestan teşeyên hazir û qalibên serwayê hene. Bo nimûne, xezel ku ji beytan pêk tê û

yekserwa ye: aa, ba, ca ... , Murebbe' ku ji bendan pêk te: aaab, cccb, dddb an jî aaaa, bbba, ccca ... û Mesnewî ku ji beytan pêk tê û cotserwa ye wiha tên qafiyekirin: aa, bb, cc, dd ... Di helbestên nûjen de qayîdeyên bi vî awayî nînin.

2.1.1. Serwa di Nêrgîza Lam û Elîfê de

Dî vê berhemê de helbestên ku bi teşeyên klasîk hatine nivîsîn xwedî serwa ne lê ne serwayeke bi rêkûpêk e. Wate, ewên ji beyt an jî ji bendan pêk hatine û heta dawiya helbestê teşe neşikestiyê, bi qayîdeyên helbesta klasîk serwaya wan hatiye sazîkirin lê piştî çend beyt an bendan serwa xera dibe û piştê dîsa vedigere ser serwaya xwe. Ji 51 helbestan 16 heb bi vî awayî ne. Di hin helbestên serbest de serwa hew di hin beşên helbestê de tê dîtin. Ji mînakên jî xuya dibe ku helbestên vê berhemê derveyî qayîdeyên helbesta klasîk in, bi awayekî nûjen hatine hûnandin.

Lew li min der bûne birînan dihêrim ah û elîfê (a)

Were seyyadê hezînan bes bike qala weremê (a)

...

Kengî vî barî dirakim çawa karibim derêxim (d)

Ne ji welat dikarim çim ne ji te ez revemê (a)

Kanîya baxê buhuştê nûreya bedra munîr î (e)

Derî û pace vekirim kanê ew bêhna qeşemê (a)

Min di dil de heye tenûr ne tenê bi şev e sohtin (f)

Bîst û çar sa'etan her disojim wax mu'teberê (x)

Ez nikarim xwe hebînim bê niyaz û derd û ney (g)

Hew dikarim bikenim qey lew li min rabûye Memê (a) (Ertekin, 2016: 9)

Ev helbesta li jor "Awazên Sofîyane; 'îşqbazî, Derd û Kelam" ji 18 misrayan pêk tê, di 9 misrayên wê de "em" wekî serwa cih digire.

...

Her kesekî re xweşhalek (b)

Di her malê de dermalek (b)

Roj û meh havîn di salek (b)

Vaye dîsa hate bihar (a)

Vê biharê em mest kirin (c)

Bi dil û can sermest kirin (c)

Ji nû ve em dilbest kirin (c)

Vaye dîsa geş bû bihar (a)

...

Hûrik hûrik bilezûbez hat (e)

Di kaşan de weke pez hat (e)

Roj û şev her nefes hat (x)
Vaye dîsa kenî bihqr (a) (Ertekin, 2016: 17)

...

eger ez wî di xewnê de bibînim (a)
weke nû ve ji xwer jînekê bînim (a)

we ger şopek li şopa wî bînim (a)
weke şopê ji zêr û zîv derînim (a)

...

reben mame li çolan gêj û dîn im (a)
dema ew bê weke bayek nesîm im (x) (Ertekin, 2016: 86)

Ji ketyan bêtir ketî me (a)
Dilê me loy loy (b)
Li heyatê me mirî me (a)
Dilê me loy loy (b)
Safiyê cerg û dilî me (a)
Dilê me loy loy (b)
Hesreta baxê wêlî me (a)
Dilê me loy loy (b) (Ertekin, 2016: 68)

Helbesta “Loy loy Loy...” ji 20 misrayan pêk hatiye. Helbest bê navber hatiye nivîsîn lê heger em helbestê beyt bi beyt veqetînin serwaya wê dibe ab,ab,ab... Misraya duyem her tê dubarekirin.

Me ne bes e li dinyayê ji hesretê hey nalîne (a)
Serê xwo rake ji xewên tarî û carek êşan bikewîne (a)

Di beroşa xwo tenê carek îd û erfatan bikelîne (a)
Bibe Xizir bibe Îlyas bibe ‘Îsa û bes binalîne (a)

Bele pê nûsê baş diramim ku em paş de mayîne (a)
Welê zanim di vê rê de derdê me hew nezanîne (a) (Ertekin, 2016: 67)

Êdî bê nale û sewt im dilbirîn im dilgirîn
Hatime ber deryê te lew dibê me ez im hezîne

Koçiya min a dinyayê li minê kirye kirasek
Hatina min a ‘uqbayê dibêje min her yeqîne

Luqman û hatifên sir pir napirsin carek ze’îfî
Di behra ‘îşqeya kûr de li nik min nabin seyîne

...

Direvim ji zirav bendan heyûla daye dû min
Vexwarê ava heyatê ji çavên min key vebîn

Ax di vê mahê zivistan agirê tenûre dil
Daye ber berojkê tavê 'enîya min a xemîn

Lu'lu û mercan û koçî dibitin hevrahê min
Lingê min qut bû ji yarê nema tên awaz hemîn (Ertekin, 2016: 52)

2.1.2. Serwa di Xeyalên Kehrebayî De

Di nav 68 helbestên vê berhemê de 21 helbest bi teşeyên klasîk (beyt an jî bend) hatine nivîsîn. Li gorî rêjeyê dike 31,0% ku rêjeya di Nêrgîza Lam û Elîfê de jî 31,0% e. Di piraniya van helbestan de jî serwa heta cihekî didome lê piştîre dişikê. Helbesta “derdê bê derman” (aa,aa) û “nedîyar” (aa,aa) bi awayê cotserwa ne. Di hin helbestên serbest de serwa di hin beşên helbestê de hatiye bikaranîn.

dipoşim ez îro derdan li dora xwo dibim poşman (a)
çeraxa weslata yarê li nik min ew nîyê mêhvan (a)

dişewtîn tev dev û lêvan li bendê awirek derman (a)
meger ez yarek bedbext im nikarim bizir kim çhvân(a) (Ertekin, 2020: 28)

hestîyar im hestîyar im hestîyar (a)
ji destê neyyaran dikime hawar (a)

bendewar im bendewar im bendewar (a)
serab e çol e li ku ma umîdwâr (a)

şehsuwar im şehsuwar im şehsuwar (a)
nema nuqtek ava heyatê hewar (a) (Ertekin, 2020: 88)

yekser kemal î
bê xişş û qal î
besse binalî
durra zelalî

bêhna te xweş tê
hilma te geş tê
dilêm nexweş tê
ez bê mecalî (Ertekin, 2020: 83)

ji min nayê ku bêjim
her tişt bi çakî dimeşe

her tişt weke nanê tennûrê naqemire û
 bêhna jîyanê li hinavan belav nake
 her tişt di hîna bû û nebûnê de diwelidê (Eretkin, 2020: 94)

her roj çarsed car dişikînim
 hestiyê zimanê xwe
 dişidim
 qalind dibe stûyên gunehan (Eretkin, 2020: 117)

2.2. Paşserwa (Redif)

Çawa ku ji navê xwe jî diyar dibe, piştî serwayê di dawiya misrayan de cih digire. Dubarekirina heman dangan e ku bi heman wateyê hatine bikaranîn an jî bi heman erkê rabûne. Ev taybetî paşserwayê ji serwayê vediqetîne. Fraz, peyv, gire, herf (deng) serbixwe an jî bi hev re dikarin bên bikaranîn. Li gorî Saraç (2007: 260) paşserwaya biwate helbestê li dora ramanêke diyarkirî dicivîne, li zemînekî hevpar bicih dike û helbestê hevgirtî dike. Paşserwa, ji ber ku bi dubarekirina heman hêmanan e, di helbestên serbest de jî ji bo xurtkirina ahengê tê bikaranîn. Di helbestên M. Zahir Ertekin de jî em rast li bikaranîna paşserwayê tên.

2.2.1. Paşserwa di Nêrgîza Lam û Elîfê de

gerdûnê dîsa te kul kir derd û efxanên di dil
 bayê kerbê te li ser kir nalîn û feryadên di dil

ketme baxçê nûristanan çûme nav rez û bîstanan
 diçim cem pîr û ciwanan kê mabin zarînên di dil

dicivin li ser hev dilînan dizarin her wekî dînan
 dilivin şubhê birînan hayho û hewarên di dil (Eretkin, 2016: 30)

Kirasê spî ye 'îşq e li dû xwe xêr û bêr hiştê
 Ketî me destê'm rahişte huner e vebîye ji nû

Berf e dibare' b dor e dest rabûne ber bi jor e
 Firikek çaya sor e dikele dilê min ji nû

Hikmetê bo me dibêje çîroka dûr û dirêje
 Berheman li me dirêje heyîn e dikele ji nû (Eretkin, 2016: 62)

Ger nebim axa wesletê
 dem dibe zindan
 ey can

hesret pê vedide dendik dendik

vêdikeve ev can

ey can

welat çavê xwe dilûse

şilope dibarîne ev çav

ey can (Ertekin, 2016: 63)

2.2.2. Paşserwa di Xeyalên Kehrebayî de

çawa werim hoşyar bibim

bikevim rêka aşiqan

nekarim mehwi yar bibim

ma ev e rêka aşiqan

qet'î hemû exyar dikim

çav û dilî xwînbar dikim

devî li dil û can dikim

ma ev e rêka aşiqan (Ertekin, 2020: 13)

qurba layezal î

çêtir e'j her hevalî

boyaxa ba xezal î

xweştir e'j her delalî

kesê ku'b te va rabe

tu caran namîne xalî (Ertekin, 2020: 17)

bi qasî hevokê were

bi qasî pîtekê here

bi qasî demsalekê were

bi qasî bîstekê here

bi qasî zimandunyayekê were

bi qasî devokê here (Ertekin, 2020: 20)

xefletê ez zuwa kirim

bê çav kêma taqet kirim

bêhal û bêhêz kirim

nizanim çî bêjim

piştî te

heyva rojane û kenînên dayika min

hilweşîyan

xaltîka min (Ertekin, 2020: 89)

2.3. Dubarekirin

Digel kêş, serwa û paşserwayê hin hunerên edebî jî di sazkirina ahengê de roleke mezin dilîzin. Ev hunerên edebî (cînas, îştîkak, qelb, ‘eks, tekrîr, ‘fade, tenasub, nîda û ww.) piştá xwe didin tekrara deng an jî gotinan. Di helbestê de deng, peyv an jî komepeyvên ku li dû hev tèn dubarekirin rîtmeke derûn ava dikin û ahenga helbestê xweş tê guhê meriv. Hamad (2020: 73) balê dikişîne ser mebesta helbestvan ku dubarekirina deng, peyv an jî hevokê nîşaneya mebesta helbestvan e da ku mijara dubarekirî derxe pêş û bike ku xwîner bi ser wê mijarê ve baje.

Xebatên li ser ahenga navekî wextê selmandinê an li gorî hunerên edebî, sernav bi sernav çûne an jî di asta asoyî û asta stûnî de dubarekirina deng û gotinan hatine tesbîtîkirin. Xebatên tirkî (Dinç, 1994; İnci, 2021; Kaplan, 2013; Selçuk, 2004) piranî li ser rêya yekê çûne lê xebatên kurdî (Hamad, 2020; Ahmed, 2019; Ahmed, 2017) li ser rêya duyê yanî di asta asoyî û stûnî li ser helbestan xebitîne. Em ê jî rêya duyê bişopînin û li ser helbestên M. Zahir Ertekîn bixebitin.

2.3.1. Dubarekirina Dengan

Deng (fonem) biçûktirîn yekeya zimên e ku roleke girîng digire ser xwe da ku ahenga navekî ya helbestê saz bike (Ahmed, 2017: 68). Dubarekirina dengan jî berhemên folklorî heta helbesta serbest di gelek cureyên edebiyatê de hatiye bikaranîn. Tekrara nedengdêran wekî “Alîterasyon”, tekrara dengdêran jî wekî “Asonans” hatiye binavkirin.

Nêrgîza Lam û Elîfê	Dengdêr											
	Hejmara Dengan	Hejmara Dengdêran	Hejmara Nedengdêran	Eyn (!)	a	e	ê	i	î	o	u	û
Metn (Dîwan)	34765	15404	19260	101	2935	4447	1773	3243	1521	439	343	703
Hejmar				0,7%	19,1%	28,9%	11,5%	21,1%	9,9%	2,8%	2,2%	4,6%
Rêje Li Dengdêran				0,5%	15,2%	23,1%	9,2%	16,8%	7,9%	2,3%	1,8%	3,7%
Rêje Li Nedengdêran				0,3%	8,4%	12,8%	5,1%	9,3%	4,4%	1,3%	1,0%	2,0%
Rêje Li Metnê		44,3%	55,4%									

Tablo 1: Rêjeya Dengdêran Di "Nêrgîza Lam û Elîfê" De

Nêrgîza Lam û Elîfê (2016) ji 34765 dengan pêk hatiye. Ji wan dengan jî 15404 heb (44,3%) dengdêr, 19260 heb (55,4%) jî nedengdêr in. Wextê ku em çav li hejmara dengdêran digerin, tê dîtîn ku dengdêrên /e/, /i/, /a/ bi rêjeyê zêde hatine bikaranîn. Ev bikaranîna ku di tevahiya berhemê de dixuye di her helbestekê de jî bi vî awayî ye. Nêrgîza Lam û Elîfê ku ji 51 helbestan pêk tê, rêjeya dengdêran herî zêde di helbesta “yekîtî”yê (47,5%) de, herê kêm jî di helbesta “loy loy loy...” (41,8%) de ye.

	Hejmar	Rêje li Dengdêran	Rêje li Metnê
Dengdêrên Kurt (e,i,u)	8033	52,1%	23,1%
Dengdêrên Dirêj (a,ê,î,o,û)	7371	47,9%	21,2%

Tablo 2: Rêjeya Dengdêrên Kurt û Dirêj Di Nêrgîza Lam û Elîfê De

Dengdêrên kurt ligel ku hejmara wan ji dengdêrên dirêj kêmtir e jî bêtir hatine bikaranîn. Ji nav dengdêrên herî zêde hatine bikaranîn /e/ û /i/ dengdêrên kurt in, dengdêra /a/ dirêj e. Zêdebûna dengdêra /e/ye kiriye ku dengdêrên kurt ji yên dirêj pirtir bin.

b	c	ç	d	f	g	h	j	k	l	m
1429	141	208	1679	172	398	832	524	1154	1069	1198
4,1%	0,4%	0,6%	4,8%	0,5%	1,1%	2,4%	1,5%	3,3%	3,0%	3,4%

n	p	q	r	s	ş	t	v	w	x	y	z
2645	249	209	2015	739	503	1050	703	768	515	880	408
7,5%	0,7%	0,6%	5,7%	2,1%	1,4%	3,0%	2,0%	2,2%	1,5%	2,5%	1,2%

Tablo 3: Rêjeya Nedengdêran Di Nêrgiza Lam û Elîfê De

Di Nêrgiza Lam û Elîfê de bi tevahî 19488 (55,4%) nedengdêr hene. Nedengdêr 11,1% ji dengdêran zêdetir in. Di nav 19488 nedengdêran de /n/, /r/, /d/, /b/ û /m/ pênc nedengdêr in ku herî zêde hatine bikaranîn.

Xeyalên Kehrebayî				Eyn (')	Dengdêr							
Metn (Dîwan)	Hejmara Dengan	Hejmara Dengdêran	Hejmara Nedengdêran		a	e	ê	i	î	o	u	û
Hejmar	34714	15393	19225	96	3228	4544	1524	3130	1532	388	451	596
Rêje Li Dengdêran				0,6%	21,0%	29,5%	9,9%	20,3%	10,0%	2,5%	2,9%	3,9%
Rêje Li Nedengdêran				0,5%	16,8%	23,6%	7,9%	16,3%	8,0%	2,0%	2,3%	3,1%
Rêje Li Metnê		44,3%	55,4%	0,3%	9,3%	13,1%	4,4%	9,0%	4,4%	1,1%	1,3%	1,7%

Tablo 4: Rêjeya Dengdêran Di Xeyalên Kehrebayî De

Xeyalên Kehrebayî (2020) 34714 deng di xwe de hewandine. Ji wan 15393 (44,3%) dengdêr in, 19225 (55,4%) jî nedengdêr in. Hejmara dengan hema bêje wekî dengên Nêrgiza Lam û Elîfê ye. Jixwe wextê ku em li rêjeyê xin rêjeya wan wekhev derdikevin. Dengdêrên ku herî zêde hatine bikaranîn bi rêzê /e/, /a/ û /i/ ye. Di bikaranîna dengdêran de /a/ derdikeve pêş ku bikaranîna wê nêzikî /i/ye be jî li gorî Nêrgiza Lam û Elîfê zêdetir hatiye bikaranîn.

	Hejmar	Rêje li Dengdêran	Rêje li Metnê
Dengên Kurt (e,i,u)	8125	52,8%	23,4%
Dengên Dirêj (a,ê,î,o,û)	7268	47,2%	20,9%

Tablo 5: Rêjeya Dengdêrên Kurt û Dirêj Di Xeyalên Kehrebayî De

Di bikaranîna dengên kurt û dirêj de jî em wekhevîyekê dibînin digel Nêrgiza Lam û Elîfê. Li vir jî dîsa dengdêra kurt /e/ serkêşiyê dike û kiriye ku dengdêrên kurt ji yên dirêj bêtir bin.

b	c	ç	d	f	g	h	j	k	l	m	n
6,9%	0,8%	1,2%	7,8%	0,9%	1,8%	4,3%	1,9%	6,1%	6,0%	9,3%	13,5%
3,8%	0,4%	0,6%	4,3%	0,5%	1,0%	2,4%	1,1%	3,4%	3,3%	4,1%	7,5%

p	q	r	s	ş	t	v	w	x	y	z
1,2%	1,2%	10,2%	3,7%	2,2%	5,4%	3,0%	4,4%	2,7%	4,6%	2,7%
0,7%	0,7%	5,7%	2,1%	1,2%	3,0%	1,6%	2,4%	1,5%	2,5%	1,5%

Tablo 6: Rêjeya Nedengdêran Di Xeyalên Kehrebayî De

Di Xeyalên Kehrebayî de 19225 (55,4%) nedengdêr hene. Nedengdêr 11,1% ji dengdêran zêdetir in. Di nav 19488 nedengdêran de /n/, /r/, /d/, /m/ û /b/ pênc nedengdêr in ku herî zêde hatine bikaranin. Ji Nêrgîza Lam û Elîfê cuda ew e ku rêza dengên /b/ û /m/yê li vir diguhere, li vir nedengdêra /m/yê ji /b/yê zêdetir hatiye bikaranîn.

	Nêrgîza Lam û elîfê		Xeyalên Kehrebayî	
	Dengdêr	Nedengdêr	Dengdêr	Nedengdêr
1	e (12,8%)	n (7,5%)	e (13,1%)	n (7,5%)
2	i (9,3%)	r (5,7%)	a (9,3%)	r (5,7%)
3	a (8,5%)	d (4,8%)	i (9,0%)	d (4,3%)
4	ê (5,1%)	b (4,1%)	î (4,4%)	m (4,1%)
5	î (4,4%)	m (3,4%)	ê (4,4%)	b (3,8%)

Tablo 7: Pênc Dengên Herî Zêde ku Hatine Bikaranîn (Nêrgîza Lam û Elîfê - Xeyalên Kehrebayî)

Ji tabloya 7ê jî diyar dibe ku di herdu berheman de jî pênc dengên herî zêde hatine bikaranîn, rêza wan biguhere jî heman deng in. Tevahiya her pênc dengdêran (bi rêza alfabetîk) /a/, /e/, /ê/, /i/, /î/ di Nêrgîza Lam û Elîfê de digihije 40,0%, di Xeyalên Kehrebayî de digihije 40,2%. Pênc nedengdêrên herî zêde hatine bikaranîn jî ev in (bi rêza alfabetîk): /b/, /d/, /m/, /n/, /r/. Rêjeya bikaranîna her pênc nedengdêran di Nêrgîza Lam û Elîfê de digihije 25,6%, di Xeyalên Kehrebayî de digihije 25,4%. Ji bilî van agahiyên em ê li jêr ji bo herdu berheman, ji bo her helbestekê, du dengdêr û du nedengdêrên herî zêde hatine bikaranin bi tabloyê nîşan bidin.

	Nêrgîza Lam û Elifê	Hejmara Dengan	Dengdêr 1	Dengdêr 2	Nedengdêr 1	Nedengdêr 2
1	awazên sofiyane: 'îşbazî, derd û kelam	646	e (13,9%)	i (8,4%)	n (7,6%)	r (6,3%)
2	helbestvanê têkçûyî	954	e (13,4%)	i (9,6%)	n (7,1%)	r (5,5%)
3	li welatê demvemirî	1005	e (13,0%)	i (10,3%)	n (8,9%)	r (5,8%)
4	bi carekê mezin bûm	1765	i (11,0%)	e (11,0%)	n (9,1%)	m (5,1%)
5	dîsa bihar	378	e (13,8%)	a (9,5%)	b (5,8%)	h (5,8%)
6	bê nale	701	e (10,4%)	i (10,4%)	n (9,6%)	r (6,1%)
7	bihara zivistanê	1064	e (13,3%)	i (9,1%)	r (8,0%)	n (7,5%)
8	evîn=name	693	e (15,2%)	i (8,7%)	n (8,9%)	r (5,3%)
9	nalînek beyhûde: leyla ye dil	909	e (13,9%)	i (9,1%)	n (6,8%)	r (5,4%)
10	dîlo ay dil	1089	i (11,1%)	e (10,6%)	n (8,2%)	r (5,7%)
11	ji vê êşê	878	e (12,6%)	i (9,8%)	d (6,8%)	n (5,6%)
12	azar û efxanên di dil	859	e (12,0%)	i (10,1%)	n (8,4%)	d (8,0%)
13	ez im zarok	496	i (12,3%)	a (8,9%)	n (7,5%)	r (6,5%)
14	hubba te di şevan de	660	e (14,4%)	a (9,7%)	n (6,5%)	r (6,5%)
15	eywana min a dilşikestî: wan	1427	e (13,7%)	a (10,6%)	n (7,4%)	r (6,5%)
16	helbesta qedandina xortaniyê	922	e (14,6%)	i (10,8%)	n (7,5%)	d (6,3%)
17	em: zarokên hêviyê	972	a (10,9%)	i (9,3%)	n (8,4%)	b (6,4%)
18	ey êş ax ey jan	1215	e (13,6%)	i (7,9%)	n (7,7%)	r (5,3%)
19	erê pismamo	679	e (12,1%)	i (10,2%)	n (8,5%)	r (7,5%)
20	karwan	423	e (12,5%)	i (11,3%)	n (9,2%)	d (5,9%)
21	şeva kaşkaşok	512	e (14,6%)	i (10,7%)	n (7,6%)	d (6,4%)
22	peşka spî, tîrsa wêrek	628	e (13,1%)	i (11,5%)	n (7,6%)	m (5,6%)
23	yekîtî	442	e (19,9%)	a (8,1%)	n (5,9%)	r (5,4%)
24	piştî ku tu çû 1	974	e (10,9%)	a (9,8%)	n (7,8%)	r,t (5,2%)
25	kulmek axa cizîrê	292	e (12,3%)	a,i (10,3%)	n (6,2%)	d (5,8%)
26	qelem	154	i (16,2%)	e (9,7%)	n (9,7%)	l (5,8%)
27	ser-ab	626	e (14,5%)	i (7,3%)	n (8,1%)	r (5,6%)
28	bişo carek evî qelbî	720	e (14,9%)	i (9,4%)	b (6,4%)	r (6,1%)
29	evîn	306	e (14,7%)	i (11,4%)	d (7,8%)	n (5,9%)
30	valahî	456	e (12,3%)	a (10,3%)	n (9,2%)	d (5,0%)
31	genimî	270	e,i (12,6%)	a (7,0%)	n (7,4%)	d (5,9%)
32	spîstan	542	e (16,4%)	i (11,4%)	r (8,1%)	n (6,3%)
33	ey can	646	e (14,1%)	a (9,6%)	n (8,4%)	d,r (4,8%)
34	însan	465	e (14,4%)	a (9,5%)	n (9,7%)	r (6,0%)
35	pênûs û zanîn	514	e (15,0%)	i (8,6%)	n (8,6%)	r (5,8%)
36	loy loy loy...	287	e (10,8%)	i,o (7,3%)	l (13,2%)	m,y (8,7%)
37	can teffîya: êdî nema	739	e (11,4%)	a (9,6%)	n (7,7%)	r (6,1%)
38	piştî ku tu çû 2	1272	e (11,2%)	i (9,6%)	n (8,9%)	r (5,4%)
39	kurtelava	187	i (11,8%)	a (10,7%)	m (8,0%)	k (7,5%)
40	heyveronî	514	e (12,5%)	i (9,5%)	n (7,8%)	d (7,4%)
41	helwestzede	423	e (16,8%)	a (9,7%)	r (7,6%)	l (5,7%)
42	si'ûda welat	969	e (12,7%)	a (11,4%)	n (7,0%)	r (6,4%)
43	îro helebçe ye	727	e (15,0%)	a (9,1%)	n (7,7%)	r (6,9%)
44	nêrgîza lam û elifê	966	e (11,9%)	i (10,5%)	n (7,1%)	d,m (4,8%)
45	demên şikestinê	1033	a (11,5%)	e (11,1%)	n (6,4%)	r (5,6%)
46	mîm û hê	616	e (12,0%)	i (11,7%)	m (7,8%)	n (7,5%)
47	qala bihareke kulfî	978	e (13,1%)	i (10,8%)	r (6,3%)	n (6,0%)
48	ya reb çawa kîm	273	e (16,8%)	i (9,5%)	r (8,4%)	m (7,0%)
49	bê qudûm	253	i (11,1%)	a (8,7%)	n (8,3%)	r (6,3%)
50	ev kat	226	e (13,7%)	i (8,8%)	n (6,2%)	r (5,8%)
51	ey wax	136	e (10,3%)	a (9,6%)	n (9,6%)	r,t,y (4,4%)

Tablo 8: Hejmara Dengên Helbestên Nêrgîza Lam û Elifê û Du Dengdêr û Nedengdêrên Herî Zêde Hatine Bikaranîn

	Deng	Dengdêr 1	Dengdêr 2	Nedengdêr 1	Nedengdêr 2
1	Xeyalên Kehrebayî	747	e (12,9%)	a (11,8%)	n (8,3%)
2	war	384	e (13,0%)	a (9,4%)	t (5,7%)
3	ma ev e rêka aşiqan?	705	e (14,6%)	a (12,2%)	m (7,0%)
4	awazên westiyayî	204	i (11,3%)	aj (8,3%)	n (10,8%)
5	çîrûskên xemê	638	e (11,1%)	a (10,2%)	n (9,6%)
6	îlahî!	190	e (17,9%)	a (11,1%)	r (7,4%)
7	hesabê sedsala stûxwar û dilnewayek	945	e (14,3%)	i (8,3%)	n (8,4%)
8	herrew/were	281	e (23,5%)	a (6,8%)	r (8,2%)
9	bihêce ez herim	257	e (13,6%)	i (10,1%)	n (7,0%)
10	ez û tu	898	e (12,4%)	a (9,0%)	m (6,3%)
11	em û ew	399	e (19,3%)	a (8,5%)	n (8,5%)
12	li ser text	430	e (14,0%)	a (7,7%)	n (6,0%)
13	derdê bê derman	305	e (15,1%)	a (9,5%)	n,r (7,2%)
14	ev	157	e (21,7%)	i (11,5%)	ç (7,6%)
15	temengîyan	284	e (16,5%)	i (7,0%)	n (6,3%)
16	bilbil	212	e (10,4%)	aj (9,9%)	r (8,0%)
17	peyarê li daristanekê bê dar	288	e (13,5%)	a (10,1%)	r (8,0%)
18	ben a hol	711	e (11,5%)	a (9,4%)	n (7,3%)
19	helebçe dîsa	624	e (14,4%)	i (8,5%)	n (9,9%)
20	pênc parçeyên wenda xaib	4338	e (11,7%)	a (9,9%)	n (8,4%)
21	helbest sewt û hewes	593	e (11,8%)	i (11,5%)	n (8,6%)
22	ev e heyat	948	e (14,0%)	a (9,7%)	n (7,5%)
23	av û ax û agir û hevî/kanî ez?	685	i (12,0%)	e (11,2%)	n (10,2%)
24	keremkanê dil û canan	633	e (13,1%)	i (10,1%)	m (8,1%)
25	tuxmê belkî	873	e (15,1%)	a (8,9%)	r (7,0%)
26	şewqa wefayê zahir nebûye	1743	e (15,9%)	a (8,8%)	r (7,2%)
27	poşmanname	1473	e (14,5%)	a (8,0%)	m (6,3%)
28	ez û ew	1032	e (14,1%)	i (11,8%)	n (8,4%)
29	wextê baranê	242	a (12,4%)	e (9,5%)	b (7,4%)
30	dil, dil	61	e (14,8%)	i (11,5%)	l,n (8,2%)
31	encamname	484	e (12,6%)	a (9,7%)	n (11,2%)
32	kurmançî	196	i (8,7%)	e (8,2%)	n (11,2%)
33	gulistan	51	a (17,6%)	i (9,8%)	n,t (7,8%)
34	daxwaz	577	e (12,0%)	i (11,1%)	n (5,7%)
35	helbest û agir û pêt	273	e (13,9%)	i (8,8%)	d (6,6%)
36	azadane-jî an serxwe(ne)bûn	143	e (11,2%)	a (9,8%)	n (11,2%)
37	baran	253	e (16,6%)	i (12,6%)	n (8,7%)
38	dayika helbestê	158	e (12,7%)	i (10,8%)	d (8,9%)
39	kî me?	251	a,e (11,6%)	l,i (7,2%)	m,n (5,6%)
40	zimanê "îşqê/zemanê" îşqê	467	e (12,4%)	i (10,1%)	n (6,6%)
41	şêwreke nerm bo bê zadiyê	136	e (13,2%)	a (11,0%)	l (10,3%)
42	heyat	268	i (15,7%)	e (10,4%)	n (8,6%)
43	nîfir	109	e (18,3%)	i (10,1%)	w (10,1%)
44	dûbare jîyan	62	a,e (14,5%)	i (9,7%)	r (12,9%)
45	vecinîqî	126	e (12,7%)	ê (7,1%)	n (7,9%)
46	nedfiyar	317	a,e (12,9%)	i (6,6%)	r (8,8%)
47	îd e û te deriyê xwe girtîye	331	a (11,5%)	i (10,9%)	n (6,9%)
48	dil	49	e (26,5%)	a (6,5%)	k,r (12,2%)
49	kefen û ax û seqem!	448	i (13,8%)	e (11,2%)	n (6,9%)
50	pilepil di qefesa dil de	75	e (22,7%)	a (10,7%)	n,s (9,3%)
51	qed a bi finda derwîn keto	893	e (13,7%)	a (9,0%)	n (8,4%)
52	dîdarî yar, diqêdêga dilê asê	410	e (14,4%)	i (9,5%)	n (5,4%)
53	sereta	85	e (20,0%)	a (15,3%)	r (16,5%)
54	îşqa melayê cisrî	258	e,i (10,5%)	a (9,3%)	n (6,6%)
55	newroz	152	e (15,1%)	a (10,5%)	n,r (9,2%)
56	ruhê dê	312	e (15,1%)	a (9,9%)	d (7,4%)
57	kesekan	115	i (14,8%)	ê (9,6%)	n (19,1%)
58	esmerê min!	1388	e (13,5%)	i (10,6%)	n (8,9%)
59	dilê min!	757	e (11,1%)	i (10,2%)	n (9,1%)
60	dema esmanî	240	e (11,7%)	a (9,6%)	n (7,9%)
61	dilê peyvê	270	e (13,7%)	a (10,7%)	n (6,3%)
62	çarek û çillek	446	e (11,9%)	a (10,1%)	r (7,4%)
63	bîra hestên birîndar	584	i (11,6%)	a (9,1%)	n (9,4%)
64	texmîsek li ser zezeleka perto begê hekkarî	893	e (14,3%)	a (11,3%)	b (6,4%)
65	mewt	693	i (11,5%)	a (10,4%)	n (11,7%)
66	pasgotinî	219	e (11,0%)	i (10,5%)	n (8,7%)
67	melodîka	660	e (12,0%)	a (10,2%)	n (9,2%)
68	bîyanîyê gîyanê xwe	285	i (10,9%)	a (9,8%)	r (7,4%)

Tablo 9: Hejmara Dengên Helbestên Xeyalên Kehrebayî û Du Dengdêr û Nedengdêrên Herî Zêde Hatine Bikaranîn

2.3.1.1. Di Helbestên M. Zahir Ertekin de Dubarekirina Dengan

Dengek an jî hin deng, carinan di tevahiya helbestê de carinan jî di beşeke wê de tên dubarekirin. Ev dubarekirin bi peywira xweşkirina muzîka hundir ya helbestê radibe (Hamad, 2020: 75). Dubarekirina dengên li asta asoyî (li pey hev) him jî bi stûnî (ji jor ber bi jêr ve) tên bikaranin. Ev bikaranin helbestê him jî hêla rîtmê xurt dike him jî dike ku şiklê helbestê xweşik bibe. Di helbestên M. Zahir Ertekin de jî hin deng hene ku ji yê din zêdetir hatine bikaranin. Ev jî dibe nîşaneyek ji bo dubarekirina wan dengên. Em ê li jêr bi rêzê ewilî ji *Nêrgîza Lam û Elîfê* û dû re jî ji *Xeyalên Kehrebayî* mînakên bidin.

2.3.1.1.1. Di Nêrgîza Lam û Elîfê de Dubarekirina Dengan

Lew li min der bûne birînan dihêrim ah û elemê
Were seyyadê hezînan bes bike qala weremê (Ertekin, 2016: 9)

Dengdêra /e/yê bi 12,8% xwedî rêjeya herî zêde ye di *Nêrgîza Lam û Elîfê* de. Di beyta jor ya helbesta *Awazên Sofiyane: 'Işqbazî, Dêrd û Kelam* de 13 caran dengdêra /e/yê hatiye dubarekirin. Di temamê helbestê de (646 deng) 90 carî ev deng tê dubarekirin.

Ne çol e êdî ne çolistan e vir
Ne xem e êdî ne xemistan e vir
Hevaltî û biratî bihevve tene vir
Yekîtî gazî te dike (Ertekin, 2016: 49)

Di vê benda helbesta *Yekîtîyê* de 17 caran , di temamê helbestê de (442 deng) 88 caran derbas dibe. Li vir em him li asta asoyî him jî bi stûnî dubarekirina dengên dibînin.

Heval û pend û şîret e edeb û av û şet e
Elîf û rewd û ni'met e dibare bi ser min ji nû (Ertekin, 2016: 62)

Bihare tu nekî derde
Nebî mexrûr nekî perde
Dest ji van awiran berde
Bişo qelbî ji vê zengê (Ertekin, 2016: 57)

Di beyta *Spîstanê* de 14 caran dengdêra /e/yê derbas dibe ku tevahiya helbestê ji 542 dengên pêk tê. Di benda *Bişo Carek Evî Qelbî* de dîsa 14 dengdêra /e/yê tê dubarekirin. Ev helbest jî ji 720 dengên pêk hatiye.

Mîn ber bi navnîşanên nediyar dibînin
Sûcê mîn sexte nasnameya mîn
Dijerizim jî durûtîya wan
Ruhê xwe nadîm wan
Dîtirsîm
Ez

Zarok (Ertekin, 2016: 32)

Di Nêrgiza Lam û Elîfê de piştî dengdêra /e/yê herî zêde dengdêra /i/yê (9,3%) hatiye bikaranin. Di vê benda Ez im Zarok de 15 caran hatiye dubarekirin. Tevahiya helbestê ji 496 dangan pêk hatiye.

*Lî pey xwe mîn bî kû ve dibî
Were nîk mîn bî mîn re be
Jîyanê heyranê
Bî bîr im bî bîrîn im
Werimîne kulên mîn
Te her dem
Dî ruhê xwe de dibîm û tînim
Têhna mîn naşkê bî penaberîyê
Bê mecal im
Tenha me li çol û li kolanan (Ertekin, 2016: 14)*

Helbesta Bi Carekê Mezin Bûm ji 1765 dangan pêk hatiye, 195 caran dengdêra /i/yê tê dubarekirin. Di vê benda destpêka helbestê de 24 caran dubare bûye.

*Lî ezmanên sayî li ser stêrkên hevraz
Lî taxên wêran
Bî bivîrê hezar sale
Tîlîyan ji bedena xwe qut dikim (Ertekin, 2016: 91)*

Dengdêra /a/yê di tevahiya metnê de 8,4% hatiye bikaranîn. Cudahiya vê dengê ji dengdêrên /e/ û /i/yê ev e ku /a/ dengdêreke dirêj e. Dengdêra /a/yê di du helbestên vê berhemê de serdest e. Di Demên Şikestinê û Em Zarokên Hêvîyê de bikaranina /a/yê li ber çavan e.

*Karwan meşîya di beyabanê de tî û bê hêştir
Çan û cama ‘îşqê şikest
Karwan
Di destê helbestvanî de jîyan û
Dargerîneka ku rehikān diqelêşe şikest (Ertekin, 2016: 84)*

*hêvî mîna baranê
barîya li ser rûyên çavbelek û bêkenan
di şevên tarî de em li hêvîya hêvîyek bi baran bûn ji xwe
baranek e hêvîbar ku
biweşîne ji dara reşistanê gunehan û
reşayîyan şil bike di nava zelalîya xwe de
bihêre bicû û valake nava ‘erdên çolenas
weke zelîxayê fena keçā sidîqê sadîq û mîna birca ‘esra bîstan (Ertekin,
2016: 39)*

Piştî van dengdêran, bi rêzê herî zêde ev dengdêrên din hatine bikaranîn: /ê/ (5,1%), /î/ (4,4%), /û/ (2,0%), /o/ (1,3%), /u/ (1,0%). Ji dengdêran dengdêrên gilover (o,u,û) hew 4,3%, dengdêrên rast (a,e,ê,i,î) 40,0% hatine bikaranin.

Di nav nedengdêran de /n/ (7,6%), /r/ (5,7%), /d/ (4,8%), /b/ (4,1%) û /m/ (3,4%) derdikevin pêş. Ji 51 helbestan di 39 helbestan de nedengdêra /n/yê serdest e. Li jêr sê mînakên din hene ku hem li asta asoyî hem ji bi stûnî nedengdêr hatine dubarekirin.

dicivîn li ser hev dilînan dizarin her wekî dînan
dilivîn şubhê birînan hayho û hewarên di dil (Ertekin, 2016: 30)
Risteyên îlahî fêrî bilbilan bike
Bila êdî tenêtiyê bes binewirînin
Çawa ku minminîk xwe davêjin êgir
Termên ebedê bixe naveroka jîyana xwe
Û bavêje nava dilan
Bila bi xîret be
Ji ber ku risteyên dawî yê sermedî ne
Deng û rengê evîna me (Ertekin, 2016: 22)

Li ser rûyê ramûsî hêlkanan vedike
Dibare bi ser hestên mededxwaz û dikele
Zarokên ji ber sermayê hinerengî
Hinarokên xwe bi berfê dişon
Ger m dibin dest (Ertekin, 2016: 20)

Dil bi tenê dilê reben wê disoje
Dil wê vedixwe dilop bi dilop
Dil we dimêje ji mêjîyê 'îşqê
Dil wê dikuje
Dil wê dide ber beroşka rehên jîyanê (Ertekin, 2016: 59)

Di Nêrgîza Lam û Elîfê de dubarekirina dengan ne bi awayekî rêzî be jî him li asta asoyî hem ji bi stûnî hin dengdêr û hin nedengdêr derdikevin pêş. Serwa û paşserwayê jî kirine ku dubarekirina dengan zêdetir û xurttir bibe.

2.3.1.1.2. Di Xeyalên Kehrebayî de Dubarekirina Dengan

Berhema Xeyalên Kehrebayî ji 34714 dengan pêk hatiye. Ji wan 15393 dengdêr, 19225 jî nedengdêr in. Ji nav dengdêran herî zêde /e/ (13,1%), /a/ (9,3%) û /i/ (9,0%) hatine bikaranin. Dengê /a/yê hew 98 caran ji dengê /i/yê zêdetir hatiye bikaranin. Dêngên /ê/ û /î/yê ji bi 4,4% gelekî nêzîkî hev in. Dengdêrên gilover (o,u,û) 4,1%, dengdêrên rast (a,e,ê,i,î) 40,2% hatine bikaranin.

çîrokek kevnare ye
berxikek dermale ye
birînek hemware ye (Ertekin, 2020: 90)

dizivrim herwekî kehkeşanan
 dilerizin ji heybeta te latên vê sedsalê
 gerdûn li dora min dizivire
 roj di heyama ku serê xwe radike
 bi rondikên min vekaş dibe
 şebnemên ku li ruyê erdê vediçirsin
 vehesinan bi min re parve dikin
 ji şadumanîya hebûna navê te
 xwe ditewînin çol û beyar û deryayên ezman sayî (Ertekin, 2020: 102)

dilovanîyê em himbêz kirine
 rehmêtê em dorpêç kirine
 de were û bikene
 devê xwe
 destê xwe û
 dilê xwe bide ber vê okyanûsê
 û
 ji xwe here
 bikeve nava vê dîlanê
 û
 li xwe were

dikenin
 dikenim
 dikene
 bikene (Ertekin, 2020: 77)

Di benda helbesta yekê de dengdêra /e/yê di her sê misrayan de 13 caran hatiye bikaranîn. Di herdu mînakên din de him /e/ him jî /i/ hem li asta asoyî hem jî bi stûnî hatiye dubarekirin.

tenê bi tama baranê bişirî
 dilê wî dikenîya
paq dibû ji pîsîya
baran dibarîya
 rû sorgewez
gîyan dikenîya
 û
 bi xwe dihesîya
 li xwe vedigerîya (Ertekin, 2020: 67)

pîra dî navbera min û te da
 bi hin kevîrên pemboyî hatîye çêkirin
nizanim ez kengî ji te rişgar dibim

nizani^m tu kengî jî min xelas dibî (Ertekin, 2020: 84)

Di van herdu perçeyên helbestan de jî dubarekirina dengên /a/ û /i/yê tê dîtin. Piştî van dengdêran (e,a,i) di berhemê de bi rêzê herî zêde ev dengdêrên din hatine bikaranîn: /î/ (4,4%), /ê/ (4,4%), /û/ (1,7%), /u/ (1,3%), /o/ (1,1%).

Di bikaranîna nedengdêran de /n/ (7,5%), /r/ (5,7%), /d/ (4,3%), /m/ (4,1%) û /b/ (3,8%) serkêşiyê dikin. Herwiha, di hin helbestan de nedengdêrên /ç/, /k/, /l/, /t/ û /w/ serdest in. Ji 68 helbestan di 43 heban de nedengdêra /n/yê serdest e.

şev natebitin
li stûkurên welatê min
ax
ji hatina mêvanên xwe
serobîno bûye

ne gazind kêr tîn li vir
ne gotin pênc pere dike
herdu jî hatin dotin
hatin sotin (Ertekin, 2020: 69)

çîrokek kevnare ye
berxikek dermale ye
birînek hemware ye (Ertekin, 2020: 90)

qefesa min
hewesa min
were sar be
li eza min

qefesa min
hewesa min
here suwar be'
nefes amin (Ertekin, 2020: 93)

dayika delal
di dest de nanê sêlê û ava zelal
dikene dimeşe dibişire vedibêje dixebite ew e xezal (Ertekin, 2020: 100)

Di helbestên Xeyalên Kehrebayî de jî hin nedengdêr zêde hatine bikaranîn û ev nedengdêr him li asta asoyî him jî bi stûnî ne bi awayekî rêzî be jî hatine bikaranîn.

2.3.1.2. Rêjeya Dengan di Nêrgîza Lam û Elîfê û Xeyalên Kehrebayî de

Di herdu berhemên M. Zahir Ertekin de rêjeya bikaranîna dengan gelekî nêzîkî hev in. Di hejmara dengan de hin ferq hebin jî di rêjeyê de pir dişibin hev. Ji

bo meriv karîbe van ferqan bibîne em ê tabloya rêjeya dengan ya herdu berhemên daynin bin vî sernavî. Herwiha ji bo ku meriv karîbe bide ber berhemeke din, em ê rêjeya dengan ya helbesta Şêxê Sen'an (Teyran, 2022: 145) jî li tabloyê zêde bikin.

		Nêrgiza Lam û Elîfê		Xeyalên Kehrebayî		Şêxê Se'nan	
		Hejmar	Rêje	Hejmar	Rêje	Hejmar	Rêje
D e n g d ê r	a	2935	8,4%	3228	9,3%	2064	7,7%
	e	4447	12,8%	4544	13,1%	3450	12,8%
	ê	1773	5,1%	1524	4,4%	1743	6,5%
	î	3243	9,3%	3130	9,0%	2281	8,5%
	î	1521	4,4%	1532	4,4%	827	3,1%
	o	439	1,3%	388	1,1%	201	0,7%
	u	343	1,0%	451	1,3%	420	1,6%
N e d e n g d ê r	û	703	2,0%	596	1,7%	647	2,4%
	b	1417	4,1%	1326	3,8%	1216	4,5%
	c	140	0,4%	154	0,4%	237	0,9%
	ç	206	0,6%	222	0,6%	184	0,7%
	d	1658	4,8%	1496	4,3%	1069	4,0%
	f	166	0,5%	174	0,5%	245	0,9%
	g	396	1,1%	346	1,0%	239	0,9%
	h	823	2,4%	826	2,4%	800	3,0%
	j	513	1,5%	373	1,1%	340	1,3%
	k	1138	3,3%	1171	3,4%	907	3,4%
	l	1064	3,1%	1145	3,3%	748	2,8%
	m	1172	3,4%	1432	4,1%	898	3,3%
	n	2632	7,6%	2599	7,5%	1586	5,9%
	p	245	0,7%	227	0,7%	181	0,7%
	q	204	0,6%	239	0,7%	313	1,2%
	r	1987	5,7%	1968	5,7%	1631	6,0%
	s	725	2,1%	715	2,1%	606	2,2%
	ş	496	1,4%	421	1,2%	574	2,1%
	t	1039	3,0%	1039	3,0%	1208	4,5%
	v	701	2,0%	568	1,6%	330	1,2%
w	760	2,2%	846	2,4%	502	1,9%	
x	511	1,5%	526	1,5%	487	1,8%	
y	866	2,5%	884	2,5%	529	2,0%	
z	401	1,2%	528	1,5%	325	1,2%	
Eyn (')	101	0,3%	96	0,3%	188	0,7%	
Tevahî:	34765	100,0%	34714	100,0%	26976	100,0%	

Tablo 10: Rêjeya Dengan Di Nêrgiza Lam û Elîfê, Xeyalên Kehrebayî û Şêxê Sen'an de

Şêxê Sen'an ji 362 bendan û 26976 dengan pêk hatiye. Menzûmeya Şêxê Sen'an bi kêşa 'erûzê, be'hra Receza Musemmena Salim hatiye nivîsîn lê di hin cihan de kêş dişikê û nêzî kêşa kîteyî dibe (Cihanî, 2019: 107).

2.3.2. Dubarekirina Peyvan

Çawa ku deng, çi dengdêr çi nedengdêr muzîka helbestê xurttir dike bi heman awayî dubarekirina peyv, fraz û hevokan jî rêbazê berbelav e di honandina helbestan de. Bi dubarekirina van hêmanan him ahenga hundirîn a helbestê tê sazîkirin him jî helbest bi şikl û rîtmê ve dikeve nav hevsgengiyekê. Üstünova (2003: 236) derbarê dubarekirinê de dibêje, taybetmendiya herî girîng

a dubarekirinê ew e ku riste bi xêra wan bi hev ve tèn girêdan û bi vî awayî hevgeriyekê saz dikin. Digel dubarekirina heman peyv, fraz û hevokan, peyvên jî hêla wateyî nêzî hev (tenasûb), dijhevî, î'ade, 'eks, regezdozî, dengên siruştî û cotepeyv jî bi vê rêbazê tèn bikaranîn. Di helbestan de ev rêbaz wekî dubarekirina dangan him li asta asoyî him jî bi stûnî heye. Herwiha, ev rêbaz di hemû teşeyên helbestê de hatiye bikaranîn.

2.3.2.1. Di Helbestên M. Zahir Ertekin de Dubarekirina Peyvan

Di helbestên M. Zahir Ertekin de hin peyv bi heman awayî hatine dubarekirin. Di herdu berheman de jî peyvên ku hatine dubarekirin piranî gihanek, daçek, cînav û kopûla ne. Herî zêde gihaneka "û"yê hatiye dubarekirin ku ew jî ji yek pêk tê. Di tabloya jêr de 20 peyvên serkêş hatine rêzkirin.

Rêz	Nêrgîza Lam û Elîfê		Xeyalên Kehrebayî	
	Peyv	Hêjmar	Peyv	Hejmar
1	û	330	û	302
2	jî	225	min	256
3	bi	208	li	239
4	li	199	bi	188
5	min	192	xwe	167
6	xwe	187	jî	142
7	e	144	e	135
8	di	131	te	107
9	de	108	ez	94
10	te	103	di	89
11	me	90	ku	86
12	ku	77	im	85
13	jî	56	tu	73
14	bê	54	da	69
15	her	52	jî	60
16	im	52	de	50
17	ez	48	her	45
18	ne	47	me	44
19	re	41	ser	42
20	ser	40	ber	42

Tablo 11: Peyvên Di Nêrgîza Lam û Elîfê û Xeyalên Kehrebayî de Hatine Dubarekirin

Ji tabloyê jî xuya ye ku peyvên herî zêde hatine bikaranîn ji yek, du an jî sê dangan pêk hatine. Heger em li cureyên din ên peyvyan binêrin ev tabloya jêr derdikeve pêş me.

Rêz	Nêrgîza Lam û Elîfê		Xeyalên Kehrebayî	
	Peyv	Hêjmar	Peyv	Hejmar
1	dil	39	wenda	39
2	dilê	35	dilê	38
3	nû	30	îlahî	30
4	dike	27	îro	29
5	were	16	tewbe	25
6	nema	16	dîbim	23
7	bişo	16	dike	20
8	şikest	16	dikim	19
9	roj	15	belkî	19
10	dîbare	15	wefayê	18

Tablo 12: Hin Peyvên din ku di Nêrgîza Lam û Elîfê û Xeyalên Kehrebayî de Hatine Dubarekirin

Herwiha, peyvên ku bi heman dengî destpê dikin jî karîgeriyê li rîtma helbestê dikin. Wextê ku me dengê serî yê peyvên helbestên M. Zahir Ertekin jimartin, tabloya li jêr sêwirî. Di tabloyê de 5 dengên serê peyvên tînan nîşandan ku herî zêde hatine bikaranîn.

	Deng	Nêrgîza Lam û Elîfê		Deng	Xeyalên Kehrebayî
		Serî			Serî
1	d	1155	1	d	1005
2	b	969	2	b	855
3	h	505	3	m	556
4	m	468	4	h	487
5	e	443	5	e	462

Tablo 13: Dengên Serê Peyvan

2.3.2.1.1. Di Nêrgîza Lam û Elîfê de Dubarekirina Peyvan

Di berhema Nêrgîza Lam û Elîfê de pîranî peyvên wekî daçek, gihanek, cînav û kopûla hatine dubarekirin. Kêm jî be navdêr, lêker û rengdêr jî hatine dubarekirin. Ev dubarekirin carinan li gorî hunerên edebî hatine bikaranîn carinan jî bi awayê paşserwayê. Him li asta asoyî him jî bi stûnî dubarekirina peyvên hatiye bikaranîn. Digel peyvên, fraz, komepeyv û hevok jî hatine dubarekirin.

gerdûnê dîsa te kul kir derd û efxanên dî dil
bayê kerbê te li ser kir nalîn û feryadên dî dil

ketme baxçê nûrîstanan çûme nav rez û bîstanan

diçim cem pîr û ciwanan kêman nabin zarînên di dil (Ertekin, 2016: 30)

Lefzê dinya li min sor bû gul û reyhanên di pir
Çavxezal û çîmenên mor roj bi roj min kirne dîn

Lew ji efxan hate xwarê rûhîyê sewdeya kes
Min ne fêhm e ne jî fem e bes girim şîretên dîn

Ah û nalên vî şa'irî çûne nig Şemseyê Aqtep
Hûriyy û xilman hemî hatine cem şemsê dîn (Ertekin, 2016: 18)

Berf dibare

Berf dibare bi ser me û

Bi ser fê'lên bêfedî yên mirovahîyê

Weke Roboskî mîna Zîlan û fena Helebçeyê (Ertekin, 2016: 20)

Hûrik hûrik bilezûbez hat

Di kaşan de weke pez hat

Roj û şev her nefes hat

Vaye dîsa kenî bihar (Ertekin, 2016: 17)

Yekîtî gazî te dike

Hevalo werin seyranê

Yekîtî gazî te dike

De ka were serê rayê

Cangoriya canan e îro

Buhuriya reşrojan e

Kelketiya dilînan e

Yekîtî gazî te dike

De were bimeş bimeş

Bes e girî bes e vereş

Gava bavêj çar û pênc û şeş

Yekîtî gazî te dike (Ertekin, 2016: 49)

bêje bêje

kelîme kelîme har dibe çolbeyar (Ertekin, 2016: 88)

çawa ku agir sor tê xwiya

ku ketê kevoka nexwiya (Ertekin, 2016: 61)

Destê qeda kişandîye sîyeh qelemê

Ev e ji min re serwerîya gav û demê

Kanî ferhad kanî şîrîn û kanî memê
 Ji êşên can an re min dermanek nedî (Ertekin, 2016: 55)

Ji ketyan bêtir ketî me
 Dilêm loy loy
 Li heyatê me mirî me
 Dilêm loy loy
 Safiyê cerg û dilî me
 Dilêm loy loy
 Hesreta baxê wêlî me
 Dilêm loy loy (Ertekin, 2016: 68)

Însan
 Di her xalê de hezar xal veşartî
 Di her nuqatê de derya hinartî
 Di her hêstirekê de çem nepenî ye

Însan
 Ne tenê xwîn û hestî ye
 Herwiha tofana ‘ewrên hestan
 Derîyê kanîya stranana (Ertekin, 2016: 65)

2.3.2.1.2. Di Xeyalên Kehrebayî de Dubarekirina Peyvan

Di Xeyalên Kehrebayî de jî wekî Nêrgîza Lam û Elîfê daçek, gihanek, cînav û kopûla peyvên herî zêde de ne ku hatine bikaranîn. Peyvên dubarekirî him li asta asoyî him jî bi stûnî hene. Peyv, fraz, komepeyv û hevokên dubarekirî bi hebûna xwe ahenga helbestan xurttir kirine. Li jêr çend ji wan dubarekirinên di helbestên cuda de hatine nîşandan.

‘ewr digirîn
ax dar û hewa
dikenin

‘ewr digirîn
kevir û newal û ajal
dikenin (Ertekin, 2020: 77)

Temen çil û çar
 Pêlika meşînî
Çil û çar cara
 Pê li ruhê min kirîye
 Li bin lingên çil û çar cara vewestî
 Hesinekî kubar ma
 Ev rewş alozalûd e

Dihêrike ber bi deşteke beyar
Ber bi rez û pirêzeyên
Ji deryayê qutbûyî
Çil û çar axxxx çil û çar
Neynik bi neynik mezin bû
Di derûna min da
Ji min ra jî
Kezebeke biraştî
Yadîgar ma (Ertekin, 2020: 109)

belkî biwelide heyat
di himbêza dayikeke sêwî sîtembar de
belkî bikewe dewran
di sînga zarokêkî bêdeng ê di deryayekê de bê nefes
dewrana di taseke av da veşartî
belkî derfîyê tobeyê
li ber lingên har û jaran jî vebe û ramûsa dilê wan jî
kî dizane

belkî welatek avadan
wêranek şênawar
kavilek kamûran bibe
ji nû ve demildest kerametkarane
kî dizane

belkî dilekî bi toz û mişt xubar
vemije ji ava jînê û
jînebar bibe
belkî sêwîyekî li ber xanîyên xerabe rûniştî
stûxwar nebe îcar
xizirek derkeve û bibe piştîyar jê re
kî dizane (Ertekin, 2020: 54)

hatin li wê bê raz û naz
mayîn li wê bê ney û saz
çûna ji wê bê şewt awaz
dîlşefîd û nepenî
‘umrê lezîz tev çîz û vîz
erda temîz ke’ba lezîz
mame veqûr halek semîz
dilrevîn û diltezîn (Ertekin, 2020: 30)

bextewar im bextewar im bextewar
tolaz goşt nema ma te hestî jî xwar

umîdwar im umîdwar im umîdwar
ne aqil ma ne sebat û cih û war

hestîyar im hestîyar im hestîyar
ji destê neyyaran dikime hawar

bendewar im bendewar im bendewar
serab e çol e li ku ma umîdwar

şehsuwar im şehsuwar im şehsuwar
nema nuqtek ava heyatê hewar

kednexwar im pirnexwar im rûnexwar
fetisîm dibêje lan bunda ne war (Ertekin, 2020: 88)

Nîrxandin û Encam

Di helbestên M. Zahir Ertekin de hewlek ji bo sazkirina helbesta klasîk bê dîtîn jî ev hewl qels maye û helbestên wî ji aliyê kêş, serwa û paşserwayê ve şikestine. Lewma rêzkirina deng û kîteyan êdî ne bi awayekî sîstematîk e. Digel vê, teknîka herî bihêz ya avakirina ahenga hundirîn, dubarekirina deng û peyvan bi awayekî serbest di helbestan de xuya dike. Helbesta nûjen ku li ser nûxwaziyê ava bûye û qalibên kevneşop red kirine, ji ahenga derveyî bêtir berê xwe daye ahenga hundirîn û karîgeriya helbestê bi vî awayî xurttir kiriye. M. Zahir Ertekin jî helbestên xwe di çarçoveya rêbazên nûjen honandiye. Di nav sînorenê vê xebatê de li ser helbestên M. Zahir Ertekin em gihane van encaman:

1. Kêş rêbaza sereke ya ahenga derekî ye lê bi helbesta nûjen ve ewilî sînorenê kêşê hatine berfirehkirin, piştî hatiye şikestin û di dawiyê de jî bi temami jî holê rabûye. Kêşa 'erûzê ku bingeha helbesta erebî ye, di helbestên M. Zahir Ertekin de nehatiye bikaranîn. Dibe ku bi qasî be an jî bê hemdê xwe be, di hin helbestên wî de hewldanên bikaranîna 'erûzê tîn dîtîn. Ev jî nîşan dide ku tesîra 'erûzê li ser wî heye. Digel vê, kêşa xwemalî ku li gorî hejmara kîteyan helbest tê sazkirin û ji kêşa 'erûzê hêsantir e, di *Nêrgîza Lam û Elîfê* de çar helbest bi cureyên kêşa xwemalî hatine honandin. Hejmara helbestên bi kêşa xwemalî di *Xeyalên Kehrebayî* de digihîje heştan. *Xeyalên Kehrebayî* bi çar salan piştî *Nêrgîza Lam û Elîfê* hatiye weşandin. Ev jî nîşan dide ku bi M. Zahir Ertekin re hewlek heye da ku helbestên bikêş binivîse.
2. *Nêrgîza Lam û Elîfê* ji 51, *Xeyalên Kehrebayî* ji 68 helbestan pêk hatiye. Em wan 12 helbestên bi kêşa xwemalî ji wan derxin di destên me de 107 helbestên bi kêşa serbest dimînin. Erê di çend ji wan de hewleke sazkirina kêşê heye lê di gelek cihê helbestan de kêş şikestiyê. Lewma me ew xistine koma kêşa serbest. Rêjeya kêşa serbest di *Nêrgîza Lam û*

- Elîfê* de 92,2%, di *Xeyalên Kehrebayî* de 88,3% ye. Di nav tevahiya helbestan de rêje digihije 89,9%.
3. Serwa û paşserwa ku me ew wekî hêmanên ahenga navekî qebûl kiribûn, di herdu berheman de jî tîna dîtin lê ne sistematîk in. Helbestên ku bi teşeyên klasîk (beyt, bend) hatine nivîsin xwedî serwa û paşserwayê ne lê ev serwa û paşserwa jî şikestî ne. Di helbestên M. Zahir Ertekin de ev qafiyê hatine bikaranîn: (aa,aa), (aa,ba), (aaaa,bbba), (ab,ab). Paşserwaya helbestan jî piranî ji kopûla, cînav û lîkêran pêk hatiye. Di nav helbestên serbest de jî di dawiya misrayan de hin gire an jî peyv hatine dubarekirin ku meriv dikare wan wekî serwa û paşserwaya şikestî qebûl bike.
 4. Di mijara dubarekirina dengên de rêza wan bi rêjeyên hindik biguhere jî di herdu berheman de bikaranîna dengên nêzî hev in. Nêrgîza Lam û *Elîfê* jî 34765 deng, 15404 dengdêr û 19260 nedengdêran pêk hatiye. Ji dengdêran 8136 kurt (e,i,u), 7441 dirêj (a,ê,î,o,û) in. *Xeyalên Kehrebayî* jî 34714 deng, 15393 dengdêr û 19225 nedengdêran pêk hatiye. Ji dengdêran 8033 kurt (e,i,u), 7371 dirêj (a,ê,î,o,û) in.
 5. Pênc dengên herî zêde hatine bikaranîn, rêza wan biguhere jî di herdu berheman de eynî ne. Di *Nêrgîza Lam* û *Elîfê* de bi rêzê: Dengdêr: /e/, /i/, /a/, /ê/, /î/. Nedengdêr: /n/, /r/, /d/, /b/, /m/. Di *Xeyalên Kehrebayî* de bi rêzê: Dengdêr: /e/, /a/, /i/, /î/, /ê/. Nedengdêr: /n/, /r/, /d/, /m/, /b/.
 6. Di herdu berheman de jî dengên /e/, /i/, /a/, /n/, /r/ û /d/ ji yê din bi awayekî li berçav zêde hatine bikaranîn. Ev dubarekirina dengên yekê di helbestan de jî tîna dîtin (bnr. Tablo: 8, Tablo: 9). Ev jî delîl e ku helbest di hundir de xwedî rîtmekê ne û bi vî rîtmê ahenga navekî ya helbestê derketiyê holê.
 7. Xaleke din a ahenga navekî; dubarekirina peyvan, -digel peyvan em firaz, komepeyv û hevokan jî dixin nav vî xalê- di sazkirina ahengê de hem di teşeyên klasîk hem jî di helbestên serbest de tîna bikaranîn. Di helbestên M. Zahir Ertekin de, di herdu berheman de jî peyvên ku herê zêde hatine dubarekirin ji daçek, gîhanek û cînavan pêk hatine. Digel wan, di helbestan de hin navdêr û lêker jî hatine dubarekirin (bnr. Tablo: 12). Ji bilî peyvan fraz û hevokên dubarekirî jî hene ku hin ji wan di her beyt an jî benda helbestê de hatine dubarekirin. Bikaranîna cotepeyvên û peyvên nêzî hev (deng an jî wate) jî di rîtma helbestan de xwedî paye ne. Herwiha hejmara peyvên ku bi dengê /d/yê destpê dikin ji hejmara peyvên din gelekî zêdetir e. Di *Nêrgîza Lam* û *Elîfê* de 1155 peyv, di *Xeyalên Kehrebayî* de 1005 peyv bi dengê /d/yê destpê dikin (bnr. Tablo: 13).

Helbestên modern gelemperî bi wezna serbest tîna nivîsandin, lewma bi kêş û ahenga klasîk ve tîkiliyên xurt danaynin. Ev jî dibê sedem ku kêş, serwa û paşserwaya di helbestê de bi zelalî eşkere nebe. Herwiha, ji ber ku di helbesta

serbest de azadiya afirîneriyê zêdetir e, bikaranîna teknîkên nû hewce ye û ên kevn jî heger bên bikaranîn bi awayekî nerm tên bikaranîn. Dîsa jî mimkin e ku di helbesta modern de hêmanên wekî 'erûz, serwa û paşserwayê bên dîtin. Me di vê xebatê de bi awayekî serveyî helbestên nûjen ên M. Zahir Ertekin dan ber xwe lê wekî her helbestê, her helbesteke wî jî xebateke serbixwe heq dike û em hêvî dikin ku xebatên berfirehtir bên kirin.

Çavkanî

- Açar, Z. (2021). Şêwaza Zimanî Di Mem û Zînê De. Di nav de A. Timurtaş & M. Z. Ertekin & A. Tek. *Xanînasî*. (95-110). Van: Weşanên Peywend.
- Adak, A. (2015). *Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk*. Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Adak, A. (2017). Aheng û Mûsîqî di Helbestên Melayê Cizîrî De. *Mukaddime*, 8 (Özel Sayı 1), 641-676. <https://doi.org/10.19059/mukaddime.364775>
- Ahmed, H. M. (2017). Teknîka Dubarekirinê di Avakirina Rîtma Navxweyî ya Helbestên Kamîran Bedirxanî de – Dîwana Dilê Kurên Min Wek Nimûne-. (Teza Lîsansa Bilind). Zanîngeha Mardin Artukluyê. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Ahmed, B. T. (2019). Di Helbestên Kanî de Muzîk. (Teza Lîsansa Bilind). Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Ako, A. A. H. (2021). Şêwaz Di Helbestên Abdulla Peşêw De. (Teza Lîsansa Bilind). Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Cîhanî, P. (2019). Şêwaza Berhemên Feqîyê Teyran. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. Yıl: 5. Cilt: 5. Sayı: 10. 101-122
- Çetin, M. A. (2021). Türk Edebiyatında Serbest Şiirin Kaynakları. (Doktora Tezi). Ankara Üniversitesi. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Çetin, N. M. (1991). Aruz maddesi. T.D.V İslâm Ansiklopedisi. C3. İstanbul.
- Aytaç, G. (1999). *Genel Edebiyat Bilimi*. Papirüs Yayınları. İstanbul
- Devellioğlu, F. (1980). *Osmanlıca – Türkçe Ansiklopedik Lugat*. Ankara: Doğu Matbaası.
- Dinç, Y. (1994). Mecâmî'ü'l-Edeb'in Şiirde Âhenk Kavramı Açısından İncelemesi. (Yüksek Lisans Tezi). Gazi Üniversitesi. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Ertekin, Z. (2016). *Nêrgîza Lam û Elîfê*. Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Ertekin, Z. (2020). *Xeyalên Kehrebayî*. Stenbol: Weşanên Peywend.
- Hamad, K. A. (2020). *Bunyada Ritîmî Di Helbestên Hêmin Da*. (Teza Lîsansa Bilind). Zanîngeha Van Yüzüncü Yilê. <https://tez.yok.gov.tr/>
- İnci, S. (2021). Mezâkî Divanî'nda Ahenk Unsurları. (Yüksek Lisans Tezi). Van Yüzüncü Yil Üniversitesi. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Kaplan, H. (2013). Bâkî'nin Ses Dünyası. (Doktora Tezi) Gazi Üniversitesi. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Kazan, R. (2015). Arap Edebiyatında Serbest Şiirin İlk Örneklerinden: BEDR ŞÂKİR es-SEYYÂB'IN "UNŞÛDETU'L-MATAR/YAĞMURUN TÜRKÛSÜ" ADLI ŞİİRİ. *Süleyman Demirel Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi*. Yıl: 2015/1. Sayı:34. 47-74
- Preminger, A. & Brogan, T.V.F. (1993). *The New Princeton Encyclopedia of Poetry and Poetics*. New Jersey: Princeton University Press.

- Saraç, M. A. Y. (2007). *Klâsik Edebiyat Bilgisi Biçim – Ölçü – Kafiye*. İstanbul: 3F Yayınevi.
- Selçuk, B. (2004). Ahenk Unsurları Bakımından Nef'î Dîvan'nın Tahlili. (Doktora Tezi) Fırat Üniversitesi. <https://tez.yok.gov.tr/>
- Teyran, F. (2022). *Fakî-yi Teyran Divan – Dîwan Feqiyê Teyran*. Werger û Şîkar Kadri Yıldırım. Ankara: T.C. Kültür ve Turizm Bakanlığı.
- Üstünova, K. (2003). Söz Sanatlarının Oluşmasında Tekrarların Rolü. *Türk Dili Araştırmaları Yıllığı - Belleten*, 49, (2001), 234-244.